Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :799 30-Îlon- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Aldar Xelîl: PYNK amade ye kursiyên xwe bi ENKS`ê re par ve bike

Aldar Xelîl diyar kir ku PYNK amade ye berî hilbijartinan kursiyên xwe bi Rêveberiya Xweser û ENKS'ê re par ve bike û da xuyakirin ku têkiliya wan bi tevayiya aliyên ku mudexeleyî Sûriyê dikin re heye.



Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di vê dawiyê de gelek geşedanên girîng çêbûn. Jê, civîna di navbera ENKS û PYNK`ê de di çarçoveya pêkanîna yekîtiya neteweyî de çêbûye. Herwiha serdana nûnerê Emerîka yê taybet ji bo Sûriyê James Jeffrey ya herêmê. Bicihkirina çekdarên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li sînorên di navbera Rojava û Başûrê Kurdistanê de.
Ji bo nirxandina van geşedanan û naskirina rastiya bûyerên dibin, ANHA hevpeyvînek bi endamê Desteya Hevserokatiya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Aldar Xelîl re çêkir.
Hevpeyvîn wiha ye:

**DI VÊ DAWIYÊ DE PYNK Û ENKS`Ê DI ÇARÇOVEYA PÊKANÎNA YEKÎTIYÊ DE LI HEV CIVIYAN, GELO DANÛSTANDIN GIHÎŞTIN KIJAN ASTÊ Û MIJARÊN KU LI SER HATINE LIHEVKIRIN ÇI NE?**

Di navbera PYNK û ENKS`ê de civînên li ser bingeha lihevkirina siyasî çêbûn. Di wê demê de nîqaş di navbera Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) û ENKS`ê de çêdibûn. Lê piştî ku nêrîna siyasî bû yek, tevahiya partiyên PYNK`ê tev lê bûn, PYD`ê nûnertiya PYNK`ê ya ku ji 24 partiyan pêk tê kir û bi vî şiklî pêvajoya duyemîn a hevdîtinan berdewam kir.
Di pêvajoya duyem de sê mijarên girîng lêveger, rêveberî û parastinê hebûn. Girêdayî lêvegerê em dikarin bêjin ku ev mijar temam bûye û tu astengiyên cidî tê de nemaye. Karê wê ew e ku bibe lêvegera bilind a Kurd û dê nûnertiya Kurdan bike. Her wiha dê nûnertiya raya Kurdan di rêveberiyê de bike bi taybet Kurdên li Rojava. Ji aliyê nûnertiyê ve, me xwest ku hemû cihê xwe di vê lêvegerê de bigirin. Li ser vî esasî li hev kirin û bi rêjeya ji sedî 40 ji endamên lêvegerê ji PYNK`ê ne û bi rêjeya ji sedî 40 ji ENKS`ê ne. Rêjeya mayî yanî ji sedî 20 dê nûnertiya partiyên derveyî PYNK û ENKS`ê bike. Lê ji bo rêjeya ji sedî 20 gelek nîqaşên girêdayî rêbazên hilbijartina wê hatin kirin. Di dawiyê de hate lihevkirinê ku ENKS`ê bi rêjeya ji sedî 10 navan pêşkêş bike û PYNK`ê jî bi rêjeya ji sedî 10 navan pêşkêş bike. Bi vî awayî dê rêjeya lêvegerê ji sedî sed be. Hejmara endamên lêvegerê 40 kes dê bi vî awayî werin belavkirin: 16 kes ji PYNK û 16 ji ENKS û 8 kesên din, 4 kes PYNK`ê diyar dike û 4 din jî ENKS`ê diyar dike
Piştre em derbasî mijara rêveberiyê bûn. Di vir de dixwazim îşaret pê bikim ku ENKS`ê di dirêjahiya salên borî de li derveyî herêmê bû. Niha jî dê tev li rêveberiya ji gelek salan ve ava bûye be. Ji ber wê mijara rêbaza tevlêbûnê bi awayekî dirêj hate nîqaşkirin. Me dît ku divê destpêkê hilbijartin li dar bikevin û li gorî encamên wê dê ENKS rêbaza tevlêbûna xwe ji Rêveberiya Xweser re nîşan bide. Lê rêveberên ENKS`ê diyar kirin ku hilbijartin dê li ser wan dijwar be û ew heta niha ne amade ne. Ji ber wê hewl dide beriya hilbijartinan tev li rêveberiyê bibe.
Divê dema pêkanîna hilbijartinan bê diyarkirin. Heta wê demê mînak heke piştî 9 mehan be yan jî salekê be, ku nîqaş li ser vê tê kirin, ji bo naskirina Rêveberiya Xweser û çawa karê wê dê nûnerên ENKS`ê cihê xwe di hin saziyên rêveberiyê de piştî lihevkirina bi rêveberiyê re, bigirin. Ev cih dê di nava kursiyên kurdan de be. Ruxmî ku yên ku tev li rêveberiyê bûn piştî hilbijartinan tev lê bûn. Lê dîsa ji bo dabînkirina serkeftina vê lihekvirinê û berdewamiya wê em ê alîkariyê ji rêveberiyê bixwazin. Her wiha PYNK`ê diyar kir ku ew amade ye hejmarek ji cihên xwe yên diyar bidin ENKS`ê. Lê dîsa jî dibêjim tu lihevkirinek girêdayî vî warî heta niha tune ye. Nîqaş û civîn girêdayî vê mijarê hîna berdewam in.
Heke ev gav bi ser bikeve, ji bo diyarkirina endamên wan di Meclisa Rêveber, Meclisa Edaletê û Meclisa Rêveberiyê de bi rêbazeke guncew li gorî qanûnan, dê rêyek ji bo tevlêkirina wan were nîqaşkirin.

**LI GORÎ DAZGEHÊN ÇAPEMENIYÊ HINEK NAKOKÎ DI NAVBERA HER DU ALIYAN DE HENE. GELO NUQTEYÊN NAKOK ÊN HERÎ GIRÎNG ÇI NE, DAXWAZIYÊN ENKS`Ê JI HÊLA GELÊN BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ VE TÊN PEJIRANDIN AN NA?**

Gelek mijarên siyasî hene ku li ser hatine lihevkirin û divê ew qebûl bikin; rêveberî ne tenê ya Kurdan e. Tê de Kurd, Ereb, Suryan û Turkman hene. Ev rêveberî destkeftiyên mezin bi dest xistin. Rêveberî bi xwe destkeftiyek gelên herêmê ye. Mijarên wekî hevserokatî, azadiyê jinê, biratiya gelan û jiyana hevpar hîna nîqaş li ser tê kirin. Em ê bi hev re kar bikin da ku vê rêveberiyê pêş bixin. Heke pêşniyarên wan girêdayî rêveberiyê hebin em dikarin nîqaş bikin. Pêvajoya nîqaşkirina rêveberiyê hîna bi dawî nebûye û bi temamî li ser nehatiye lihevkirin.
Pêvajoya sêyem a mijara ewlehî û leşkerî ye. Ev mijar li ser nîqaş nehatiye kirin. Heke em bigihêjin vê pêvajoyê divê gelek mijar werin nîqaşkirin. Ne pêkan e ku du hêzên leşkerî li herêmê hebe ji bo ku kêmasî çênebin.

**GELO ENKS LI TIRKIYÊ MÎNA DEWLETEKE DAGÎRKERA XAKA SÛRIYÊ DINÊRE?**

Belê têkilî di navbera ENKS û Tirkiyê de hene. ENKS'ê hîna endamek di îtîlafa Sûriyê de ye. Ji ber wê bawer nakim ku niha helwestekê li beramberî wê bide, di demekê de ku diyalog di navbera aliyên Kurdî de didome. ENKS hewl dide ji mijarên girêdayî îtîlafa Sûriyê û Tirkiyê dûr bikeve. Em jî ji aliyê xwe ve hewl didin ku di peydakirina mekanîzme û rêbazên pêşxistina diyalogan û derbaskirina pirsgirêkên ku li pêşiya me derdikevin de, aliyekî bin. Hin mijarên hestiyar hene me ji aliyên ENKS'ê re hiştine da ku di pêşerojê de di nav xwe de çareser bike.

**TÊKILÎ DI NAVBERA CIVÎNÊN YEKÎTIYA KURDÎ Û BELAVKIRINA PDK'Ê HÊZÊN XWE NÊZÎ SÎNOR JI ALIYÊ SÊMALKA VE ÇI NE?**

Di demekê de ku em dixebitin da ku rêbazên yekitiya rêza kurdî peyda bikin, dewleta Tirk êrişî hêzên şoreşger ên li çiyayên Kurdistanê li ser sînorê Başûrê Kurdistanê û Bakurê Kurdistanê dike. Heman demê dagirkerî êrişî gundên Başûrê Kurdistanê dike, gihaşt wê astê ku êdî şêniyên başûr nikarin di nava zeviyên xwe de kar bikin û sûdê jê bigirin. Li ser sînorê Başûr- Rojava tevgera pêşmergeyan heye. Lê rastî em nizanin sedem çi ye.
Ev mijar hemû di demekê de ku hewl dide yekitiya rêza kurdî pêk bînin, çêdibin. Wekî me got, bi rastî hêviyên me ji vê cûda bûn, ji destpêka diyalogan de me hêvî dikir ku ev pirsgirêk hemû bi Başûrê Kurdistanê re derbas bibana, lê berovajî wê derket. Em teqez dikin ku tişta ku diqewime nakokiyan ji bo me çêdike.

**HEMWEXTÎ CIVÎNÊ, NÛNERÊ EMERÎKAYÊ YÊ JI BO SÛRIYÊ JAMES JEFFREY GIHAT HERÊMÊ Û HEVDÎTIN BI HER DU ALIYAN RE PÊK ANÎ. GELO NÎQAŞÊN BI JEFFRY RE LI SER ÇI BÛN?**

Serdana Jeffrey sembolîk bû, ya ku hate nîqaşkirin di heman çarçovê de bû ku Amerîkayê tenê di medyayê de behs dike, nîqaş di vê çarçoveyê de bûn û nîqaşên girîng tune bûn.
Wekî ku em dizanin, ew bi zelalî naaxivin. Jeffrey di civînê de piştgiriya xwe ji bo diyalogên ku di navbera aliyan de pêk tên piştrast kir. Lê derbarê gefên Tirkiyê yên li ser herêmê de bersivên dîplomatîk bûn. Wekî ku me got serdan sembolîk bû. Em dikarin bêjin ku serdana Jeffrey peyamek ji Rûsan, an Tirkan, an rejîmê re ye. An jî peyamek ji me re ye, an jî peyamên siyasî yên Wezareta Derve ya Amerîkayê ne. Lê têkildarî koordîneya di navbera Koalîsyona dijî DAIS'ê û mijarên din de ew didome. Em dikarin bêjin ku serdana Jeffrey peyameke ji bo domandina vê piştgiriyê bû.
Careke din em piştrast dikin ku serdana Jeffrey ji bo piştgiriya diyalogên di navbera aliyên Kurdî de ye. Lê di derbarê seredana xwe de tu xalên din zelal nekir.

**PIŞTÎ CIVÎNÊ, ALIYAN DEST BI ÎDIAYAN KIR KU JEFFREY SOZ DA KU NAHÊLE TIRKIYE ÊRIŞÎ HEREMÊ BIKE. GELO EV CÛRYEKE ŞERÊ TAYBET E KU MIROV PARASTINA XWE LI DIJÎ DAGÎRKERIYA DEWLETA TIRK REHET BIKE?**


Jeffrey negot ku ew nahêlin ku Tirk êrişî herêmê bikin. Lê belê got ku Amerîka wisa digot. Wek hûn dizanin dema Tirkiyê êrişî Serêkaniyê û Girê Spî kir lihevkirinek li ser agirbestê çêbû. Amerîka her dem dibêje ku wê bi Tirkiyê re li ser agirbestê li hev kir û ev nabe ev lihevkirin were binpêkirin. Ji ber vê yekê em nikarin hêviya xwe bi wan daxuyaniyan ve girêdin. Erê, ev daxuyanî dikarin bêne nirxandin, lê hemî hêvî li ser wan nabin.
Ya girîng di vê merhaleyê de ev e ku em ji her tiştê ku diqewime an dê di rojên pêş de biqewime amade ne û li ser vê bingehê divê mirovên me li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hay ji xwe hebin, ji ber ku em dizanin ku Erdogan dîsa hewl dide êriş bike û herêmê dagir bike. Divê em baş zanibin ku Erdogan cîranê me ye û em nikarin ji bo her daxuyaniyê pişta xwe bidinê.

## Mamoste û xwendekaran sala nû ya xwendinê bi kêfxweşî pêşwazî kirin

**Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo**

Li bakur û rojhilatê Sûriyê sala nû ya xwendinê dest pê kir.
Mamosteya Dibistana Şerîf Redê ya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo Rîham Xelef, li ser vekirina dibistanan ji rojnameya me re wiha axivî: "Ji bo parastina tenduristiya xwendekaran ji vîrûsa Korona, ev demek e em amadekariya xwe dikin. Bi alîkariya mamosteyan me dibistana xwe paqij kir û tedbîrên pêwîst girtine. Tevî tirsa gel ji vê nexweşiyê, heta asteke baş malbat zarokên xwe dişînin dibistanê û bi me re dibin alîkar."
Rîham Xelef axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji ber ku ziman hebûna civakê ye, pêwîst e em li hebûna xwe xwedî derkevin. Sala nû ya xwendinê li xwendekaran pîroz dikim û ji wan re serkeftinê dixwazim."
Xwendekara refa yekê Tala Mehmûd jî wiha axivî: "Ji ber ku min dixwest biçim perwerdeyê, bi biryara vekirina dibistanan ez kêfxweşbûm. Ji bo ku em bi nexweşiya Korana nekevin, pêwîst e her tim em destê xwe bişûn û maskeyan bi kar bînin. Bi hêvî me hevalên min jî xwe biparêzin."








# Şehîd Rustem Cûdî hat bîranîn

*Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD)* di salvegera şehadeta Rustem Cûdî de got, "Li hemberî şerê taybet divê asta têkoşîn û berxwedanê were bilindkirin. Armanca me rizgarkirina erdê dagîrkirî ji dewleta Tirk e." *R-2*



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 799 30-Îlon- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## QSD`ê li gundewarên Dêrezorê dest bi pêngaveke nû kir



QSD`ê li ser sînorê Iraq-Sûriyê yê bejayiya Dêrezorê bi beşdariya hêzên bejayî û asmanî yên Koalisyona Navneteweyî dest bi pêngavekê kir. *R-2*

# Ser 4 Hezarî re dibistan vebûn




Li bakur û rojhilatê Sûriyê, roja Yekşemê 4 hezar û 92 dibistanan deriyên xwe ji nêzî 900 hezar xwendekarî re vekirin. Ji bo parastina xwendekaran ji koronayê, tedbîrên pêwîst hatin girtin. *R-6*

## Dûrxistina nûnerên gelê Sûriyê ji kongreyan bû sedema encamên trajedîk




Seroka Desteya Rêveber ya MSD'ê li Kobanê di panelekê de got, "Dûrxistina nûnerên rastî yên gelê Sûriyê ji kongreyên ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê, bi awayekî neyînî û trajedîk bandor li gelê Sûriyê dike." *R-4*

## Konferansa Yekîtiya Parêzeran ya Herêma Cizîrê bi dawî bû



Konferansa 4an ya Yekîtiya Parêzeran ya Herêma Cizîrê, bi hilbijartina rêveberiyên yekîtiyê bi dawî bû. *R-5*

## KNK: Operasyona li dijî HDP'ê tolhildana DAIŞ'ê ye



KNK'ê bi daxuyaniyekê operasyona li dijî HDP'ê şermezar kir û got, "Ev operasyon tolhildana şkandina DAIŞ'ê ye." *R-4*

# Şehîd Rustem Cûdî hat bîranîn

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) di salvegera şehadeta Rustem Cûdî de got, “Li hemberî şerê taybet divê asta têkoşîn û berxwedanê were bilindkirin. Armanca me rizgarkirina erdê dagîrkirî ji dewleta Tirk e.”

Hevserokê PYD`ê Enwer Muslim di merasima Meclisa Malbatên Şehîdan ji bo bîranîna şehîdên di dem û cihên cuda de şehîd bûyîn, ku yek ji wan şehîd Rustem Cûdî ye, li Goristana Şehîd Rustem Cûdî ya li Berkevirê axivî.
Enwer Muslim, endamê Meclisa Giştî ya PYD`ê Ebdulkerîm Saroxan, hevserokê Desteya Parastinê ya Herêma Firatê Ismet Şêx Hesen û nûnerên partiyên siyasî û şêniyên Dirbêsiyê tevlî merasimê bûn.
Enwer Muslim got, “Ev neh sal in Rustem Cûdî şehîd bûye. Rast e şehîd bûye lê di nava me de zindî ye.”
Muslim di nava axaftina xwe de behsa şerê taybet yê dewleta Tirk li herêmê dimeşîne, kir û wiha got: “Li hemberî vî şerê taybet divê em asta têkoşîn û berxwedanê bilind bikin. Armanca me rizgarkirina tevayiya erdê dagîrkirî ji dewleta Tirk a dagirker e, mîna Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî û herêmên din.”
Muslim di dawiya axaftina xwe de şehîd Rustem Cûdî û tevayiya şehîdên azadiyê bîr anîn û soza şopandina riya wan da.
Paşê bi navê malbata şehîd Rustem Cûdî birayê wî Xelîl Osman axivî û bixêrhatina beşdarên merasimê kir. Xelîl Osman got, Em bejna xwe li hemberî giyanê şehîdan ditewînin. Şehîd Rustem Cûdî ji bo azadiya gelê xwe û ji bo birûmet bijî canê xwe feda kir.”
Merasim bi durişman bi dawî bû.



## Artêşa Tirk hêzeke din derbasî Sûriyê kir

Li herêma “bêçek” di navbera hêzên hikumeta Şamê û çeteyên dewleta Tirk a dagîrker de şer dewam dike. Di heman demê de dewleta Tirk a dagîrker hêzeke leşkerî ya nû derbasî herêmê kir.

Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê da zanîn ku hêzên hikumeta Şamê herêma Ehsem, El-Bara, El-Fitêra, Kensefra û Filêfil li çiyayê El-Zawiyê topbaran kirin. Çeteyên dewleta Tirk jî baregehên hêzên hikumetê Hizarîn, Kefer Nibil û El-Melaciqa yên başûrê Idlibê topbaran kirin. Lê derbarê ziyanan de ti agahî nehatin bidestxistin.
Roja Înê bi şev di nava hêzên hikumetê li gundewarên Idlibê de di encama êrişeke balafirên bêpîlot ku tê payîn çeteyan kombûna hêzên hikumetê li her du gundên Kefer Betîx û Dadîx yên li eniya bajarokê Meir Dibsê li gundewarê rojhilatê Idlibê hedef girtibûn de teqîn pêk hatin.
Ji aliyekî din ve jî, karwanekî nû yê dewleta Tirk a dagîrker derbasî Sûriyê bû. Karwanê ku ji wesaitên leşkerî û pêdiviyên lojîstîkê pêk dihat di deriyê Kefer Losîn ê bi sînorê Lîwaya Iskenderonê re derbasî Sûriyê bû û ber bi nuqteyên leşkerî yên dewleta Tirk a dagîrker li herêma “bêçek” ve çû.



## Lîlwa Ebdullah ji hewldana kuştinê rizgar bû

Berdevka Fermî ya Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê Lîlwa Ebdullah ji hewldana kuştinê rizgar bû û ajokarê wê birîndar bû.

Li gorî agahiyên dezgehên çapemeniyê û torên civakî par ve kirîn, li dijî Berdevka Fermî ya Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê Lîlwa Ebdullah hewldana kuştinê hatiye kirin.
Hat ragihandin ku dema Berdevka Fermî ya Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê Lîlwa Ebdullah di riya Xurafî ya Dêrezorê re derbas dibû, kesên nenas gule li erebeya wê reşandin. Lîlwa Ebdullah rizgar bû û ajokarê wê birîndar bû.
Derbarê bûyerê de ti aliyan daxuyanî nedane.
Ev cara 5’an e ku şaneyên veşartî hewl didin Lîlwa Ebdullah bikujin. Hewldan têk diçin.



## Leşkerên Tirk li ser sînorê Girê Spî sîvîlek kuştin

Leşkerên artêşa Tirk ya dagîrker yên li ser sînorê Girê Spî ciwanek kuştin.
Çavkaniyan, diyar kir ku ciwanê hatî kuştin bi navê Mihemed Remedan Şerîf Hoş ji gundê Bû Omer ê rojhilatê Dêrezorê ye.
Cenazeyê wî roja Şemiê li gundê Nistel ê Girê Spî hat dîtin û birin nexweşxaneyên Girê Spî.
Xizmekî ciwanê hatî kuştin diyar kir ku Mihemed ji bo kar hewl da derbasî Tirkiyê bibe.
Li gorî Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê, ji destpêka aloziya Sûriyê heta niha 453 sîvîl, di nav de 80 zarok û 44 jin ji aliyê leşkerên Tirkiyê ve hatine kuştin.



## QSD`ê li gundewarên Dêrezorê dest bi pêngaveke nû kir



QSD`ê li ser sînorê Iraqê-Sûriyê yê bejayiya Dêrezorê bi beşdariya hêzên bejayî û asmanî yên Koalisyona Navneteweyî dest bi pêngavekê kir.

Roja Înê QSD`ê pêngava ewlekariyê ragihand û hêzên bejayî yên Koalisyona Navneteweyî bi balafirên xwe tevlî hemleya têkoşîna li dijî şaneyên çeteyên DAIŞ`ê yên terorîst ên li herêma Wadî El-Ecîc a li ser sînorê Sûriyê-Iraqê ya li bejayiya bakurê Dêrezorê bûn.
Li gorî çavkaniyan QSD`ê bi alîkariya Koalisyonê Navneteweyî tûnelên şaneyên çeteyên DAIŞ`ê li Dêrezorê ji bo veşartina xwe û ya çekan bi kar tînin, kirin armanc.
Herwiha çavkaniyan diyar kir ku hemleyê riyên ku çete ji bo veguhastin û qaçaxçîtiya çekan bi kar tînin, kirine hedef. Çeteyên DAIŞ`ê bi van kiryaran hewl didin ewleyî û aramiya welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê têk bibin.

## Li çola Sûriyê êrişên Rûsya li dijî DAIŞ’ê

Di demekê de ku şerê di navbera hêzên hikumeta Şamê û çeteyan de dewam dike, balafirên şer yên Rûsya li dijî çeteyên DAIŞ`ê yên li çola Sûriyê bombebaran dijwartir kirin.

Balafirên şer yên Rûsya nuqteyên çeteyên DAIŞ`ê yên li çola Sûriyê yên li sêkoşeya Hema, Heleb û Reqa topbaran kirin û li çolê di navbera çeteyên DAIŞ`ê û hêzên hikumeta Şamê de şer derdikeve.
Berî niha Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê (SOHR) diyar kiribû ku li çola Sûriyê balafirên Rûsyayê rojane digerin û herêmên ku çeteyên DAIŞ`ê lê hene, bombebaran dikin û çeteyên DAIŞ`ê jî êrişî nuqteyên hêzên hikumetê yên li deverên cuda yên çolê dikin.
DAIŞ li çola Şola ya rojavayê Dêrezorê heta bi çola Bokemal û rojhilatê wê, riya Dêrezorê, Meyadîn, riya Himêmîm, riya Tedmir a li rojhilatê gundewarên Humsê, herêma Resafa ya gundewarên Reqayê, rojhilatê gundewarên Hemayê û çola Siwêda di nava tevgerê de ye.
Di hefteyekê de li derdora 48 leşkerên hikumeta Şamê ji wan efser û endamên fermandar hatin kuştin, bi dehan birîndar bûn.





# Nîşana jinan bû sembola Mihrîcana Lêlûn

11 derhênerên jin yên sînemayê, bi fîlmên li ser rewşa jinan, beşdarî Mihrîcana Lêlûnê ya Navneteweyî bûn. Nîşana jinan bû sembola xelatên mihrîcanê.

Ji aliyê beşdarbûnê, derhêneriya sînemayê û fîlmên li rewşa jinan ve, derhênerên jin roleke girîng di çalakiyên Mihrîcana Lêlûnê ya Navneteweyî de lîst.
11 derhênerên jin beşdarî çalakiyên Mihrîcana Lêlûnê ya Navneteweyî bûn, ku 21`ê Îlonê dest pê kir û 27`ê Îlonê qediya. Jinan fîlmên li ser rewşa jinan û urf û adetên civakê ku li ser wan tên sepandinn, nîşan dan.
Kesên li ser xebatên mîhrîcanê disekinin, hewl dan rola jinan derxin pêş û peyemekê bidin civakê.
Komîteya ku çavdêriya mîhrîcanê dike, peykerekî jinên Kurd çêkir û wekî sembola xelatên Mîhrîcana Lêlûnê ya Navneteweyî pejirand.
Endama Komîteya Amadekar a çalakiyên Mîhrîcana Lêlûnê Zîlan Silêman îşaret bi rola jinan di derhêneriyê de kir û wiha got: “Birêxistinkirina mîhrîcanê li kampa ku bi hezaran koçber lê dimînin, cihê serbilindiyê ye. Ne hêsan e ku bi derfetên kêm mîhrîcaneke li ser asta navneteweyî bê lidarxistin.”
Zîlanê wiha domand: “Welatî bi kelecaneke mezin li fîlmên mîhrîcanê temaşe dikin. Ev yek moralê dide me ku em karê xwe berdewam bikin.”
11 Derhênerên Jin Fîlmên Xwe Pêşan Dan
Zîlanê bal kişand ser beşdarbûna jinan di mîhrîcanê de û got: “Li ser astê sînemayê, 11 derhênerên jin li ser asta Kurdistanê û cîhanê fîlmên xwe di Mîhrîcana Lêlûnê de pêşan dan. Her wiha fîlmên li ser rastiya jinan û qeydên ku civak li ser ferz dike û îradeya jinan, hatin pêşandan. Gelek fîlmên ku beşdarî mîhrîcanê bûne, xwedî wateyên girîng in. Her wiha fîlmên li ser urf û adetên civak li ser jinan ferz dike û fîlmên ku pirsgirêkên civakî yên bandorê li jinan dikin wekî berdan û zewacê, hatin pêşandan.”
Zîlanê wiha lê zêde kir: “Mînak, fîlmê Sah ku dê di mîhrîcanê de bê pêşandan. Fîlm behsa îradeya jinan dike ku çawa dikare astengiyên civakê derbas bike û xewnên xwe pêk bîne.”
Jin wek sembola Mihrîcana Lêlûnê hat pejirandin
Zîlan Silêman sedema hilbijartina sembola jinan wekî sembola Mîhrîcana Lêlûnê ya Navneteweyî eşkere kir û wiha got: “Me sembola jinan ji bo xelatên mîhrîcanê pejirand, ji ber ku jin sembola xwedawendan e û ruh dide civakê. Ji ber vê yekê, me jin wekî sembola xelatên mîhrîcanê pejrand. Peykerê hatiye pejrandin, jineke ku cilên folklorî yên Efrînê li xwe kiriye û teşî di destê wê de ye. Sînema jî wekî teşiyeke wêneyan û dîmenan e ku tevlihev tên kirin. Li dora peyker şerîtê sînemayê hatiye gerandin û li ser “Lêlûn” hatiye nivîsîn.”
Zîlan wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Jin bi hemû rêbazan hewl dide xwe îspat bike. Wekî jinên Efrînê em îspat dikin ku em ji dijmin bi hêztir in. Dê hemû şêwazên dijmin ên şikandina vîna jinan bi bin kevin.”




## Li Baxçeyê Xwendinê eleqedariya ji bo pirtûkan kêm e

Li Qamişlo Baxçeyê Xwendinê ji 2019`an ve hatiye vekirin, lê baxçe ji xwendevanan bê par e.

Baxçeyê Xwendinê ji aliyê Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê ve di 2019`an de li taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo hatiye vekirin. Di baxçe de holeke ji bo civînan û pirtûkxaneyek heyn.
Di wê pirtûkxaneyê de pirtûkên bi kurdî, erebî û tirkî jî hene.
Herwisa di baxçe de peykerê helbestvan û nivîskarên Kurd Cegerxwîn, Şêrko Bêkes, Mûsa Anter û Osman Sebrî hene.
Armanca Desteyê ji vekirina vî baxçeyî teşwîqkirin û pêşxistina çanda xwendinê di nava civakê de bû.
Baxçe ji bo xwendevanan fersendeke hêja ye, lê baxçe ji xwendevana vala ye.
Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê ev çar car in Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol li Qamişlo vedike. Ev pêşangeh li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê lidarxistin.
Têkildarî mijara kêmbûna xwendinê hevserokê Yekîtiya Rewşenbîran a Herêma Cizîrê û berpirsê Baxçeyê Xwendinê Ebûd Mexso da zanîn ku pêwîstiya civakê bi xwendinê pir heye û got, “Lê mixabin xwendin ne li gorî dilê me ye.”
Mexso diyar kir ku gotina Cegerxwîn “Xwendin nebe kes naçe pêş” ji xwe re kirine durişmm û got, “Lê ew pêşketina xwendinê ji bo pirtûkên dîrokî, rêzimanî, helbest, roman, çîrok û yên çîrokan jî xwendina wan heye jî lê ne di asta ku tê xwestin de.
Mexso diyar kir ku carinan şagirtên Zanîngeha Rojava pirtûkan dixwînin û tên li baxçe li serê gotûbêj dikin û dîdariyên rewşenbîr û nivîskarin jî li vir çêdibin, ev gaveke baş e lê hê jî têrê nake.
Mexso got, eger civak dûrî xwendinê bimîne, wê bandoreke neyînî bi pêşketina civakê bike. Mexso bang li gelê Kurd kir ku ji pênc saliyê heta heftê salî xwendinê bikin û got, “Niha îro nivîskarên me hene, rûspiyên me jî hene, xwendinê dikin û pirtûkan dixwînin, şîreta ku li me dikin dibêjin bixwînin. Çimkî wan baş zaniye ka çiqas bandora xwendinê li ser pêşketinê heye.




EW ROJ

KURDÊN AZAD



Farûk SAKIK

Barzanî û KDP (bi zanebûn nabêjim PDK) çima li kêleka dijminê xwe cîh girtin û êrîşî tevgera azadiya Kurdistan kirin? KDP çima hîç bi du şopê dîroka xwe neket? KDP çima ji dîrokê ders negirt? KDP çima li pêşiya yekitiya netewî bû asteng?

Her tişt 25 sal berê destpêkir. Di rewşeke defacto de herêmek azad û Kurdistanek azad avabû. Desthilatdarî di destê wan de ye û roj bi roj bi malbatî dewlemend dibûn. Hemû rêyên kaniyan û desthilatdariyê di destê wan de bû. Navê wan hêdî hêdî di nav lîsteya herî dewlemend ê cîhanê de derbas dibû. Qesir û Residence/rezidansê wan hebûn. Lê li aliyê din gel jî di nav belengaziyek de û di serdemek dijwar de dijiya.

KDP bi danûsandin û teslîmbûna dewleta Tirk re dixwest vê dewlemandiya xwe biparêze.

Lê tiştek û hêzek ku vê dewlemendiya wan tehdîd dikir jî derketibû hole. Di nav civaka Başûrê Kurdistan de hişyariyek çêbûbû. Êdî ‘kurdên azad’ hebûn.

PKK li kuderê bi paradigma, fikr û ramanên Rêber Apo têdikoşiya, li wêderê Kurdên azad bi rêxistin dikir. Ev Kurdên azad sîstema dagirkeran, talenkar, qirker û li başûr jî Barzaniyan tehdît dikir. Ev Kurdên azad di van salên dawî de, li Başûrê Kurdistan, li dijî dagirkerî, gendelî, bêrêtî û rêveberiya xemsar serî hildidabûn. Û êdî ji riveberiya herêma Kurdistan hesab dipirsîn. Li ser vê yekê, êrîşî Kurdên azad kirin. Lê bi tu awayî nikaribûn wan bidin seknandin.

Mînaka herî nêz li Şeladizê derket holê. Kurdên azad êrişî bargehên dewleta Tirk a dagirker ku tê de pêşmergeyên KDP ji hebûn, kirin. KDP aciz bû û êrîşî gel kir, lê dîsa jî nikarîbû wan bide seknandin.

Malbata Barzanî û KDP nikarîbûn pêşî li vê pêla gel bigirin, vegeriyan êrîşî PKK kirin. Dixwestin sînoran di navbera PKK û Kurdên azad de deynin. Dixwestin dilsoziya gel a bi gerîla û PKKê re qût bikin. Di gotin; PKK bu sedem ku dewleta Tirk li herêma Başûr bicih bûye. PKK li vêderê nebûya wê dewleta Tirk êrîşî herêma Kurdistan nekira. Jibîrkiribûn ku di 2017an de, di pêvajoya referandûma serxwebûnê de êrîşên dewleta Tirk ji ber sedema hebûna PKK nebû.

Jibîrkirin dema ku DAÎŞ êrîşî Şengalê û herêma başûrê Kurdistan kir, PKK ne li herêmê bû.

Jibîrkirin; PKK valahiya kesên ku ji ber DAÎŞê bi zanebûn bazdan tijî kir û gel ji karesata mezin rizgar kir.
Jibîrkirin ku konvoya gerîlayan, li ser lava û daxwazên Barzanî, di nav Hewlêrê de derbasbû û çû Mexmûrê rizgar kirin.

Lê gel jibîr nekir. Gel bû şahid ku gerîla û şervanên PKK’ê wê demê bi lehengiyek mezin li dijî DAÎŞ’ê şer kirin.
KDP ji gel, ji Kurdan, ji Kurdistan, ji nirxan û ji mirovahiyê dûr ketiye. Xewn û xeyelên Kurdan yên yekitiyê bomberduman dike. Li pêşiya yekitiya Kurdan gelek astengî derdixe. Wisa dike ku ev yek bi başûr jî sînorkirî nehişt. Hin kes û rêxistin ji vê yekê sûd (maddî û manevî) wergirtin û bûn parçeyek ji siyaseta KDP’ê.

Lê îroj madem Kurdan ev rastî dîtin dive ku biryarek bigirin. KDP were tecrîd kirin û li derveyî xebatên yekitiyê were hiştin. Israr û banga ji bo KDPê, hedefa yekitiya netewî roj bi roj bi derengî dixe. Dive êdî xebatên yekitiya netewî bê KDP werin domandin. Heger tê xwestin ku li çar parçeyî yekitî were avakirin, li parçeyê Başûr bi ‘Kurdên azad’ re xebatên yekîtî were destpêkirin. Sazî û dezgehên ‘Kurdên azad’ dikarin tevlî nav van xebatan bibin û ji van xebatan re pêşengtî bikin.

# Nexweşxaneya Dil û Çavan hewl dide barê welatiyan sivik bike

Rêveberiya Nexweşxaneya Dil û Çavan hewl dide barê lêçûna tenduristiyê ji ser welatiyan sivik bike. Di wê çarçoveyê de cîhaza "Excimer Lasik" hat aktîfkirin da piştre bê xebitandin. Bi vî awayî alîkariya nexweşên çavan tê kirin û lêçûna emeliyata çavan kêm dibe.

Berê nexweşên herêma Cizîrê ji bo çêkirina emeliyata çavan neçar bûn biçin bajarên Sûriyê yan Başûrê Kurdistanê. Çimkî cîhaza "Excimer Lasik" ku emeliyata çavan bi lêzer çêdike tinebû. Ji ber lêçûna emeliyetê û lêçûna zêde ya rêwîtiyê, welatiyan gelek zehmetî didîtin.
Rêveberiya Xweser hewl dide ji her alî ve xizmeta welatiyan bike. Ji bo wê Desteya Tenduristiyê nexweşxaneyeke taybet ji bo û dil û çavan li bajarê Qamişlo vekir.
Rêveberiya nexweşxaneyê di demeke kin de cara yekê li herêma Cizîrê cîhaza "Excimer Lasik" li nexweşxaneyê aktîf kir. Pisporê nexweşiyên çavan Dr. Mistefa Ebdulkerîm da xuyakirin ku kadroyên tenduristiyê li ser cîhaza "Lêzer" ango "Excimer Lasik" hatin perwerdekirin. Perwerde bi çavdêriya bijîşkên ji Helebê ku di nexweşiyên çavan de pirspor in û karin cîhaz baş bi kar bînin, pêk tê.
Dr.Mistefa Ebdulkerîm diyar kir ku endeziyarên pispor cîhaz bi temamî ji bo xebitandinê amade kirin û wê bijîşk di demeke kin de piştî çend rûniştan perwerdeyê bi dawî bikin.
Cîhaza "Excimer Lasik" ji cîhazên herî pêşketî ye di aliyê dermankirina nexweşiyên çavan de, ku tê de ronahiya lêzerê tê bikaranîn.
Ebdulkerîm da zanîn ku wê cîhaz di demeke nêz de bê xebitandin. Herwiha emeliyata "Lasik" emeliyateke xweşikkirinê ye û armanc jê xilasbûna ji berçavikan e.
Di beşa nexweşiyên çavan û dermankirina wan de cîhazên pêşketî wekî cîhaza (Otto),



cîhaza (Phaco) ê ji bo rakirina madeya spî ji çavan, cîhaza (Osset) ê kişandina tora çavan, cîhaza (Corneal topography), cîhaza (Saha Basariyê) û cîhazeke din a çavan hene. Nexweşxaneya Dil û Çavan li bajarê Qamişlo hat vekirin û bi salvegera damizrandina Rêveberiya Xweser re 21`ê Çileyê, ket xizmetê. Nexweşxane xizmeta tenduristiyê pêşkêş dike û bi nirxekî kêm emeliyata dil û çavan dike.

# Sala xwendinê ya 2020-2021ê li rojavayê Kurdistanê dest pê kir

**Darîn SILÊ/Ronahî Qamişlo**

Piştî vekirina dibistanan li bakur û rojhilatê Sûriyê, ji bo xweparastina ji vîrûsê mamoste û xwendekar tedbîrên çawa digirin?
Hevseroka Desteya Perwerdeyê ya herêma Cizîrê Rohat Xelîl, li ser vekirina dibistanan ji rojnameya me re wiha axivî: "Me xwe plan kiribû ku 1ê Îlonê dibistan werin vekirin, lê ji ber belavbûna nexweşiya korona hat paşxistin. Dibistan bi giştî hatine paqijkirin û ji bo perwerdeyê amade ne."
Rohat Xelîl axaftina xwe wiha domand: "Piştî belavbûna nexweşiyê planên nû hatin çêkirin. Li gorî jimarê wê xwendekar werin dabeşkirin. Di her refê de wê 15





xwendekar hebin û her xwendekarek li ser maseyekê be. Jimara dibistanên me li herêma Cizîrê nêzî 2225an e. Ji ber pirbûna xwendekaran hin dibistan bûn du beş. Beşek danê sibehan, beşa din danê êvarê ye. Ji bilî wê, hefteyê carekê li ser vîrûsa Korona û xweprastina jê wê wane bên dayîn. Ji bo pêşîgirtina kombûna xwendekaran divê mamoste baldar bin. Çimkî nexweşî belav dibe. Bi vekirina dibistanan re wê pêngava 2. ya paqijyê were destpêkirin. Li gorî jimara dibistanan wê alavên baqijiyê werin belavkirin."
Rohat axaftina xwe bi van gotinan qedand: "Ji ber êrişên dewleta Tirk yên ser bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî û belavbûna vîrûsa Korona, perwerde hatibûn sekinandin. Em bi hêvî ne ku malbatên xwendekaran bi me re alîkar bin û li tenduristiya zarokên xwe miqate bin."
Li ser heman mijarê rêvebera Dibistana Mihemed Selîm Xelef Mamoste Xanê Xelîl Îsa jî wiha axivî: "Berî niha me amadekariya vekirina dibistanê kiribû. Li dibistana me 35 ref hene. Bi hevkariya mamosteyan dibistan hat paqijkirin. Li dibistanê nêzî 300 xwendekar û 29 mamosteyî hene. Mamosteyên me jî tev jin in. Ji ber xetera nexweşiya Korona, di sala nû de wê xwendekar werin dabeşkirin. Di her refekê de wê 15 xwendekar tenê hebin. Pirtûkên nû hatîn jî wê li xwendekaran werin belavkirin."
Xanê Xelîl axaftina xwe wiha qedand: "Ji tirsa nexweşiyê hin malbat zarokên xwe naşînin dibistanê. Em bi hêvî ne ku malbat jî bi me re alîlkar bin û zarokên xwe ji dibistanê qut nekin. Rast e nexweşî dewam dike, lê emê bi derfetên heyî wan biparêzin. Daxwaziya me ji malbatên xwendekaran ew e ku li malê jî li tenduristiya zarokên xwe miqate bin."

# Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 4 hezar û 92 dibistanan deriyên xwe ji xwendekaran re vekirin

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê roja Yekşemê 4 hezar û 92 dibistanan deriyên xwe ji nêzî 900 hezar xwendekarî vekirin. Ji bo parastina xwendekaran ji koronayê, tedbîrên pêwîst hatin girtin.
Li gorî biryara Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li bajarok, bajar û navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê roja Yekşemê dibistan hatin vekirin.
Li gorî Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê 4 hezar û 92 dibistanên seretayî, navî û amadeyî hene. Desteya Perwerde û Fêrkirinê bi hevkariya Desteya Tenduristiyê tedbîrên parastina xwendekaran ji koronayê girtin. Herwiha wê xwendekar maskeyan bi kar bînin û girêdayî dûrxistetina ji qelebalilxê bin.





## Navê Pêşmerge jî xera kirin!

**Ahmet AKTAŞ**

Vê rêveberiya Hewlêre, Pêşmerge, ji naveroka xwe, ji wateya xwe, bi kurtayî ji rûmet û keramet û dîroka xwe dûr xistin.
Wateya Pêşmerge; ew kesê li pêş diçe mirinê, canfeda, canbexşê welat û gelê xwe ye. Li ser vê naveroka bi şeref ev nav hatiye afirandin.
Di sala 1946'an de, bi avakirina Komara Kurdistanê re, Pêşewa Qazî Mihemed, ji bo navekî ji Arteşa xwe re bibîne, li Mehabadê civîneke berfireh li dardixe. Li gel nîqaşên dûr û dirêj, di encamê de, Ehmed Desmal ê çaygerê Pêşewa vî navê pîraz pêşniyaz dike û ji aliyê hemû beşdarên civînê tê pejirandin.
Tê gotin Mele Mistefayê bavê Mesûd û bapîrê Mesrûr û Neçîr jî li wê civînê amade bû.
Ê baş e, ew hêza bi wî navê pîroz û bi wê armanca bi şeref a parastina Komara Kurdistanê û rizgarkirin û geşkirina hemû Kurdistanê hatibû damezrandin, nuha çi dikin an jî çi erkdarî danîne ser milên wan?
Erê pirs û gotin yekser ji neviyên wî kesê ku wî jî ev nav pejirndibû; Nêçîr û Mesrûr re ye.
Nuha ev hêza bi rûmet, we xistiye xizmeta bê rûmet, we xistiye xizmeta dewleta faşîst û dagirker û kurdkuj a Receb û Bahçelî. We armanca wan berovajî kiriye, ne bo parastina Kurd û Kurdistanê, dijberî Kurd û Kurdistanê.
Ma parastina MİT û baregehên leşkerê dewleta Receb ê qirkerê Kurdan, erk û peywira Pêşmerge ye? Ma avakirina qerekolên Seddam, ji Sêmalkê heta Sihêla seranserê sînorê Başûr û Rojavayê Kurdisitanê, bi cihkirina Pêşmergeyên bi kamerayên modern û termal, ne projeya Receb e?
Her wiha dorpoçkirina Mexmûrê û Şingalê, derîgirtina Sêmalka û bi giştî ji hevqetandina Kurd û Kurdistanê ne daxwaze Receb e, ji we?
Sed heyf û mixabin, we ew PÊŞMERGE'yê li ser felsefe û mirazê Pêşewa û gelê me yê pîroz hatibû damezrandin we xerakir. Bê şerm we Roj jî lê zêde kiriye! Yê ku dagirker perwerde bike ew ê çawa li dijî dagirker şer bike?
Ma gelo ew hewldanên bi navê yekrêziya kurdan a ku nuha bi navê ENKS'ê tê meşandin û J.Jeffrey garantoriya wê hildide ser milê xwe, ne parçeyê heman projeyê ye? Ma digonce; ji alîkî ve ji bo Kurdistanî negihên hev, hûn sînoran bi çekên giran û modern qayim bikin, dorpêçê li ser gelê me deynin û bejin "em yekîtî û tifaqa Kurd û Kurdistaniyan dixwazin"!?
Ev bêrêziya we, li himberî Pêşewa Qazî Mihemet, Mustefa Berzanî, hemû şervan û gelê Kurdistanê ye, bi taybetî jî bê rûmetiya herî mezîn jî hûn li himber şehîdên Kurdistanê dikin. Ma wan xwîn rijand ji bo hûn bikin mal û milk ji malbatên xwe re, ji bo hûn bixin xizmeta neyarên Kurdistanê, mêtinger û qirkeran?
Bê gûman şopdarên wan Pêşewayên nemir û xwediyên doza wan, li ser piyan e û ji we û hevparên we yên dagirker û qirker bi hêztir in. Hilbet ew ê tola wan kesayetiyên heja û dîrokî ji we bistînin û Kurdistana Azad ava bikin!



# Konferansa duduyan ya Kongreya Star ya kantona Hesekê bi dawî bû

Konferansa 2. ya Kongreya Star ya Kantona Hesekê ya bi durişma "Bi Têkoşîna Hevrîn û Zehrayê dagîrkeriyê biroxînin û şoreşa jinê misoger bikin" hatî lidarxistin, bi biryarên girîng û hilbijartina koordînasyona nû bi dawî bû.

Konferansa 2. ya Kongreya Star ya kantona Hesekê ku bi beşdaria 125 delegeyên kongreyê roja Yekşemê li Xwarginageha Teyfûr hate destpêkirin bi biryarên girîng bi dawî bû.
Di konferansê de rapora du salan a xebata Kongreya Star ji aliyê endama Komîteya Civakî ya Kongreya Star a kantona Hesekê Neda Salih ve hat xwendin û nîqaşên girîng li ser hatin kirin. Herwiha rewşa jinên Kantona Hesekê hat nirxandin.
Di nîqaşên girêdayî rewşa rêxistinî de bal hate kişandin ser girîngiya xurtkirina koordîneyê di navbera saziyan de ji aliyê bîrdozî ve, piştgiriya jinên kantonê di her alî de, çareserkirina pirsgirêkên wan û hişyarkirina ji bandora zewicandina zarokan.
Ji bo xurtkirina rêxistina jinê li kantonê biryarên girîng hatin girtin. Çend biryar wiha ne:
-Ji bo pêşxistina kar û xebatê, proje ji jinên navçe û gundan re bên pêşxistin.
-Ji bo avakirina civakeke demokratîk û bihêzkirina jinan di warê edaletê de, têkoşîn li hemberî têgehên paşverû yên ku li pêşiya jinan dibin asteng were kirin.
-Projeyên aborî yên ji bo jinan werin pêşxistin.
- Xebatên komîteyê komînan li bajarok û navçeyan werin birêxistinkirin.
-Asta têkoşîna li dijî dagîrkeriyê were bilindkirin da ku koçber vegerin warê xwe.
-Bi koordîneya Komîteya Perwerdeyê akademiyên Kongreya Star li Hesekê werin vekirin.
- Xebatên li ser esasê azadiya Rêber Apo bên domandin.
-Piştgirî ji jinên ciwan ên li kantonê li hemberî têgehên paşverû were kirin, xebatê jin di warê çandê de were pêşxistin.
Piştre, hilbijartin pêk hatin. Di encamê de Evîn Paşo, Lîlav



Hisên, Bêrîvan Îsmaîl, Şukriya Mihemed û Narîman Ehmed bûn endamên Koordînasyona Kongreya Star a kantona Hesekê. Herwiha endamê komîteya Perwerde, Parastin, Aborî, Ragihandin, Kevana Zêrîn, Şaredarî, Edalet, Tenduristî û Civakî jî hatin hilbijartin.


# "Jin sembola edaletê ye"


**Jiyan BOZO**
**Ronahî Qamişlo**

Peyama parêzeran: "Sazkirina qanûnan, parastin û gihîştina dadmendiya civakî"
Îna borî Yekîtiya parêzerên Kantona Cizîrê konferasa xwe ya çaran li dar xist. Konferasê bi tevlîbûna Hevseroka Tevgera Civaka Demokratik (TEV-DEM) Zelal Ceger, Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk Enwer Mûslim, nûnerên Rêveberiya Xweser yên herêma Cizîr, Firat û Şehbayê herwiha nûnerên meclisa dadweriya civakî dest pê kir. Di konferansê de parêzerên Kurd, Ereb û Asûr-Suryan amade bûn.

### CEWHERÊ XWE BIPARÊZIN

Têkildarî mijarê Endama Yekîtiya Parêzeran ya Qamişlo Xedîca Îbrahîm, ji rojnameya me re wiha axivî: "Konferans du salan carekê tê lidarxistin û karê salên derbasbûyî tê nirxandin. Herwiha rêveberiyake nû ji 7 kesan (3 ji wan jin) tê hilbijartin.
Xedîce Îbrahîm li ser erkên jinan jî ev nirxandin kir: "Ji ber ku jin di cewherê xwe de sembola edaletê ye, divê em wî cewherî biparêzin. Herwiha belgekirina destdirêjiyê, kuştin û revandina jinan li herêmên me yên dagîrkirî erkên me ne. Ji bo ku em





dengên wan bigihînin saziyên navneteweyî divê em rola xwe baş pêk bînin. Em hêvîdar in kesên hatîn hilbijartin û jinên parêzer têkoşîna xwe xurttir bikin, parêzvanên mafê jinê bin û ji êrişan re bibin bersiv."

### EM DENGÊ GELÊ XWE NE Û EMÊ MAFÊ WÎ BIPARÊZIN

Hevseroka tevgera civaka demokratîk Zelal Ceger jî ji rojnameya me re ev nirxandin kir: "Ji ber ku saziyeke me ya civaka sîvîl e û parêzerî pîşeyeke pîroz e em jî bi keyfxweşî tevlî vê konferansê bûn. Ji bo parastina pergala li herêmê hatî danîn rola parêzeran girîng e. Bi destpêkirina şoreşa 19ê Tîrmehê re dadgehên gel hatin avakirin. Ji bo van dadgehan parêzeran qanûn amade kirin û ji bo meşandina wan kedeke mezin dan.
Zelal Ceger axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Parêzer mirovin zanyar in. Di xebata civakî û gelek sazî û rêxistinên cuda de cî digirin. Weke din, di felsefeya me de edaleta civakî heye û zindan nînin, lêbelê ji ber ku em di rewşeke aloz de ne, îro gelek girtî hene. Ji bo parastina mafê mirovan divê edaleta civaka demokratîk pêş bikeve. Ji bo ragihandina êriş û sûcên dijmirovî yên dewleta Tirk ya dagîker ji dinayayê re, divê parêzer bibin dengê gelê xwe. Her parêzer divê sozê bide ku mafê gel biparêze. Li gorî sîstema Neteweya Demokratîk emê bikarin edaleta civakî pêş bixin."

# 'Me xwest di Mihrîcana Lêlûn de rola jinê derkeve pêş'



**Ferîda Zade/Jinnews**

Jinên ciwan yên tevlî mihrîcana Lêlûn ya Neteweyî bûyîn rol û hebûna xwe ya di mihrîcanê de derxistin pêş û gotin, "Me xwest rolek me di hundirê mihrîcanê de hebe. Ji bo wê me xebata disiplînê hilbijart da em parastina gelê xwe bikin. Me xwest di Mihrîcana Lêlûn de rola jinê derkeve pêş."
Bi pêşengiya Komîna Sînama ya Avrîn mihrîcana Lêlûn a Neteweyî 21'ê Îlonê li kampa Serdem û Berxwedan dest pê kir û bi pêşkêşkirina filimên curbicur didome. Jinên ciwan yên beşdarî Mihrîcana Lêlûn bûyîn derbarê rol û hebûna xwe ya di mihrîcanê de ji ajansa nûçeyan Jinnews re parve kirin.

**'Me xwest di Mihrîcana Lêlûn de rola jinê derkeve pêş'**

Ji Rêveberiya Komîteya Disiplînê, Dilîvan Reşîd derbarê xebata xwe ya di mihrîcanê de wiha axivî: "Me jjinên ciwan nexwest em normal tevlî mihrîcanê bibin. Me xwest rol û hebûna me jî di vê mihrîcanê de jî hebe. Ji ber wê me karê disiplînê xwest. Me xwest di Mihrîcana Lêlûn de rola jinê derkeve pêş. Em ne filimên kurdî tene pêşkêş dikin. Ji nêzî 150 weletan filim di hundirê mihrîcanê de li kampa Serdem û Berxwedan tên pêşkêşkirin. "

**'Karê disiplînê di mîhrîcanê de hat hilbijartin'**

Kênc Xemîs jî bal kişand ser girîngiya lidarxistina mihrîcana Lêlûn a Neteweyî ya li ser xaka Şehbayê û wiha got: "Cara yekê ye ku li ser xaka koçberiyê mihrîcana Lêlûn a Neteweyî tê lidarxisitin. Ev cihê pêşketin û moral e. Me jinên ciwan karê dîsiplînê di mihrîcanê de hilbijart ji bo parastina gelê xwe. Em ji 7'ê êvarê heta 10'an tevlî mihrîcanê dibin. Em bi hêvî ne ev mihrîcan bi serkeftî derbas bibe. Mihrîcana Lêlûn ji bo gelê Efrînê gelek girîng e."


# Îlham Ehmed: Dûrxistina nûnerên gelê Sûriyê ji kongreyan bû sedema encamên trajedîk

Seroka Desteya Rêveber ya MSD'ê li Kobanê di panelekê de got, "Dûrxistina nûnerên rastî yên gelê Sûriyê ji kongreyên ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê, bi awayekî neyînî û trajedîk bandor li gelê Sûriyê dike."

Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD( panelan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi durişma "Ber bi kongreyeke neteweyî ve ji bo gelê Cizîr û Firatê" li dar dixe û roja Şemiyê panelek li bajarê Kobanê li dar xist.
Panel li Hola Newroz a Kobanê li dar ket. 130 siyasetmedarên Kurd û Ereb û êlên pêkhateyên Ereb û Kurd ên herêma Firatê, siyasetmedar, rewşenbîr, nûnerên saziyên Rêveberiya Xweser û saziyên civaka sivîl tev li panelê bûn.
Seroka Desteya Meclisa Rêveber a MSD`ê Îlham Ehmed axivî û diyar kir ku nûnerên rastî yên gelê Sûriyê tev li civînên derve yên navneteweyî yên girêdayî çareseriya aloziya Sûriyê nebûn. Aliyên sponserên van civînan, aliyên xwedî projeya herî girîng ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê dûr xistin.
Îlham Ehmed wiha got: "Nûnerê hikumeta Şamê nûnertiya partiya Baasê kir, ne hêviyên gelê Sûriyê yê ku ji ber şer azaran dikişîne. Nûnerên opozisyona Sûriyê jî nûnertiya ajandeyên dewleta Tirk kirin. Van civînan bi xwe re encamên trajedîk anîn serê gelê Sûriyê. Ew jî asta daxwaziya sponserên wan civînaan (Cinêv, Astana û Soçî) di dirêjkirina temenê aloziyê de nîşan dide."
Tê payîn panel bi gotûbêjkirina mijarên diyaloga Sûrî-Sûrî, diyaloga bi opozîsyonê û hikumeta Şamê re, diyaloga Kurd-Kurd û bandorên wê li ser çareseriya siyasî ya li Sûriyê bidomin.




## Ebas: Tevgerên PDK'ê xeter in û gefê li hewldanên yekîtiya kurdî dixwin



Sekretêrê Giştî yê Partiya Kombûna Niştimanî ya Kurdistanê (PKNK) Mihemed Ebas tevgera leşkerî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li ser sînorê Rojava- Başûrê Kurdistanê bi serdana Nêçîrvan Barzanî ji bo Tirkiyê û hevdîtina wî bi Erdogan ve girêda û got, "Di navbera Erdogan û PDK'ê de têkiliyên xurt hene."
4'ê Îlonê, Serokê Hikûmeta Başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî serdana Tirkiyê kir û bi Wezîrê Derve yê Tirkiyê Mevlûd Çawîşoglu û Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan re hevdîtin kir. Piştî serdanê Erdogan da xuyakirin ku li ser mijara PKK'ê nîqaş kirine.
Mihemed Ebas wiha got: "Eger em sedema kolana xendekan ji PDK'ê bipirsin wê bêje mijar ewleyî ye. Lê divê em nas bikin ka çima vê gavê diavêje. Gelo çekên xwe tîne beramberî me, an xeterek li ser PDK'ê heye yan jî xeterek li ser hebûna kurdî heye, mijar çi ye?"
Mihemed Ebas axaftina xwe wiha domand: "Eger PDK wek bira li me nanêre, em bêjin ku em du welatên cîran in li gorî urfên navdewletî, dema welatek hêz û çekên xwe li ser xeta sînorê welatê cîranê xwe bi cih bike û xendekan bikole, divê ji aliyê din re mijarê zelal bike."
Ebas diyar kir ku mafê Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriya Demokratîk heye ku şandeyekê ava bikin ku bi PDK'ê re li ser vê mijarê nîqaş bike û got, "Bicihkirina hêzê li ser sînor pêwîstiya wê bi lêkolîn û erêkirina her du aliyan heye."

**'AVAKIRINA BAREGEHAN GEFÊ LI HEWLDANÊN YEKÎTIYA KURDÎ DIXWE'**


Mihemed Ebas got, divê PDK ji nêzîkatiyên ku xizmeta doza kurdî naki dûr bikeve. Ev gav wê bihêle ku PDK gelek berdêlan bide. Divê di zûtirîn demê de sedema vê gavê diyar bike. Em nêzîkatiyên bi vî rengî qebûl nakin."
Mihemed Ebas da xuyakirin ku avakirina baregehan li xeta sînorê Başûr- Rojavayê Kurdistanê gefan li hewldanên yekîtiya kurdî dixe û wiha domand: "Gava ji aliyê PDK'ê ve hatiye avêtin gefê li hewldanên yekîtiya kurdî dixwe û dixe nava xetereke mezin. Ne li ser asta Rojava tenê, di heman demê li ser asta Kurdistanê û navneteweyî.
Sekretêrê Giştî yê Partiya Kombûna Niştimanî ya Kurdistanê (PKNK) Mihemed Ebas da zanîn ku her tevgereke PDK'ê tiliya Erdogan tê de heye û bang li Barzanî kir ku tevkariya xwe ya bi Erdogan re terk bike."

## 'Em banga hevdîtinê dikin lê hikumeta Başûr xendekan dikole'

Dayîkên şehîd û gêrîlayên HPG`ê li ser kolana xendekan ya li ser sînorê Başûr û Rojava ji aliyê hikumeta Başûr ve, diyar kirin ku banga hevdîtinê dikin û hikumeta Başûr xendekan dikole.
Di vê demê de ku Rojava û Başûrê Kurdistanê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve dibin hedef û xebata yekîtiya kurdî di qonaxa xwe ya duduyan de ye, hikumeta Başûrê Kurdistanê li ser sînorê Başûr-Rojava de çeperan çêdike û çek û cebilxaneyên giran dikişîne ser sînor.
Derbarê mijarê de dayîkên şehîd û gêrîleyên HPG`ê yên ji bajarê Qamişlo axivîn.
Dayîka bi navê Iqlîma Hisên bal kişand ser kolana xendekan ya sala 2014`an ya ji aliyê hikumeta Başûrê Kurdistanê ve û got, "Em hemû çûn wê deverê û bi me destê xwe me xendek girtin."
Di sala 2014'ê de PDK`ê li ser sînorê Başûrê û Rojava xendek kolabûn. Ev ji aliyê gelê Rojava ve hatibû protestokirin.
Dayîka Iqlîma got, "Dewleta Tirk van kiryaran dike, çimkî dijmina me ye. Eger dewleta Tirk dijmina me be, dijmina wan e jî."
Dayîka Iqlîma da xuyakirin ku Kurd hemû birayên hev in û daxwaziya yekîtî û azadiyê dikin. Em mafê xwe dixwazin, em banga Kurdistaneke azad û serbixwe dikin."
Herwiha dayîka Hemdiya Silêman kolanna xendekan şermezar kir û da zanîn ku hikumeta Başûr bi van kiryarên xwe, xwe dike dijmina birayê xwe û got, "Em vê qet qebûl nakin."
Dayîka Zehra Keleş jî da zanîn ku dema hevdîtin an lihevkirinek di nava Kurdan çêdibe, kefxweşî di dilê wan de çêdibe û got, "Divê em Kurd yek bin, em sînor û çekan di navbera xwe de bi kar neynin."



## Sûcdarkirina Xiristiyanan li hember Kurdan ya ne di cî de



Derwêş M. FERHO

Berî çend heftiyan di rojnameya Pallieterke de du hevpeyvînên cuda hatin weşandin. Yek bi Jakob Kürün re, endamê Civaka Kildanî-Katolîk li Mechelen.
Ya din bi Johny Messo re, serokê Şêwra Aramiyên Cihanê (Syriac). Her du meriv dev ji sersebebên zor û zilma li xelkê wan hatiye kirin berdane, berê xwe didin Kurdan û rêvebiriyên wan. Çi hatibe kirin Kurdan kiriye, kurd dikin.
Rexneya di cî de diparêzim. Lê yên ne di cî de û xelet qebûl nakim.
Komkujiya di hember Xiristiyan û gelên din li herêmê di 1915 de gihaşt asta herî bilind. Hedefa Osmaniyan paqijkirina nava welêt ji hemû gel û olên din ku şupheya muxalefetê bi wan re heye. Ev komkujî û paqijî ji sed salî ve di nav dewleta Turk de jî didome. Ev rastiyek e.
Her du berpirsiyarên hevpeyvînê bi tekrar dibêjin "ev zor û zilm ji aliyê Kurdan û Turkan pêk hatiye". Bi taybetî Kurdan û rêvebiriyên wan dikin hedef û hêz û biryar û planên dewletê tim piştî çav dikin.
Dema ev her du kes dibêjin "Kurd îro jî axa me ji me distînin, xelkê me direvînin û tehdîd dikin. Zor û zilmê li me dikin." zêde ye. Ev îddîa ne di cî de ye. Bêbextiye. Ji ber ku li ciyê rêvebirî û hêzên Kurdan xwedî biryar û bi hêz in, serokeşîr jî di nav de, bi her awayî ol û gelên din di nav xwe de diparêzin.
Di ciyekî de jî dibêjin "alîkariya ji Kurdan re diçe di çarçeweya siyasî û leşkerî de di hember me xiristiyanan de tê bikaranîn.
Û sedema herî mezin ku DAIŞ hêrîş anî ser herêma me Nînove hêzên Kurd û Iraqî bûn. Ji bo me hêzên herî xeter nîjadparêzên Kurd û partiyê Şîa ne. Ojdan û rehm! Li Başûr û li Rojava, hêzên Kurd bûn ku ji bo temamê xelkê herêmê, Kurd, Asûrî, Ermenî, Xiristiyan û Êzîdî biparêzin ji 20 000 zêdetir şehîd dan.
Her du jî dibêjin "Kurd di herêmê de tiştekî ava nakin, bes îqtîdarê dixwazin." Xuya ye ew rastiya herêmên Kurdan naxwazin bibînin û bi zanebûn lê bi niheqî Kurdan sûcdar dikin. Gelo ew hêzên leşkerî yên ji Xiristiyanan di nava hêzên hêrêmên di bi Kurdan re pêkhatine, xwendegehên ji bo perwerdeya bi zimanê wan vebûne, parastina dêr û dezgehên wan, nûnerên xelkê wan bi navê wan di parlementoya Başûr û rêvebiriya Rojava de, jiyana rojane di nava civaka wan de bi orf û adedên ola wan nabînin? Yan jî naxwazin bibînin. Yan jî bexîltiyê dikin. Ew tiştên ku rêvebiriyên Kurdan li Başûr û Rojava ji bo wan, bi derfetên herî kêm avakirina ji sed sal û vir de xewn û xeyalên wan bûn lê rayedarên Turkiyê, Îran, Iraq û Suriyê rê nedidan. Kurdan ji bo wan ev daxwaz û hêvî bi hezaran şehîd kirine rastiya jiyanê. Li welatên derdorê di qanûna bingehîn hebûna wan jî înkar e. Li herêmên Kurdan hebûna wan di qanûnê de rastiyek e.
Li ciyekî jî dibêjin "em ji Ewropa hêvî dikin ku zextê li hikûmeta Iraqê bike ku leşkerê wê û ya Kurdan ji herêmên me, bi taybetî ji Nînove dûrkeve. Bes ya me bimîne". Hê xirabtir, J. Messo dibêje Rêxistinên Cîhadî û komunîst mîna PKK li Bakûr/Başûrê Turkiyê, PYD/YPJ li Bakur/Rojhilatê Suriyê li Xiristiyanan zorê dikin û wan ji herêmên wan diqewitînin". Piçekî ojdan lazim e. Van tevgerên Kurdan, li Başûr û li Rojava bi hezaran şehîd dan û herêm ji hêzên terorîst paqij kirin. Ev çi bêbextî ye? Gelo hedef xwe li ber dagîrkerên Turk û Ereb şîrîn bikin e? Meraq dikim.



# Konferansa Yekîtiya Parêzeran ya Herêma Cizîrê bi dawî bû

Konferansa 4an ya Yekîtiya Parêzeran ya Herêma Cizîrê, bi hilbijartina rêveberiyên yekîtiyê bi dawî bû.

Konferansa Yekîtiya Parêzeran ya Herêma Cizîrê ya 4an ya bi durişma "Peyama parêzeriyê bicihkirina zagonan û parastina mafan û pêkanîna dadmendiya civakî ye" li Hola Beylesan ya li navçeya Amûdê dest pê kirî, bi dawî bû.
Di konferansê de hevseroka TEV-DEM'ê Zelal Ceger axivî û da zanîn ku pêkanîna konferansê di vê demê de berxwedanek e. Herwiha diyar kir ku şerê li ser Rojhilata Navî di vê demê d, çareseriya wê, sîstema neteweya demokratîk e ku rêber Abdullah Ocalan daniye.
Zelal da zanîn ku îro hiqûq ketiye xizmeta siyasetê û got, "Divê yên guhertinê di siysetê de bidin çêkirin, hiqûqnas bin, di vê aloziya siyasî de ku desthilat dide meşandin erkê herî mezin dikeve ser milê hiqûqnasan da mafên mirovan biparêzin."
Paşê parêzer Enwer Mislim da zanîn ku gelek nav ji parêzeran tên dayîn lê ya giring ew e di rola parêzeran de ku edaletê pêk bînin û got, "Divê em palpiştbin ji her kesê mezlûm re û em layîqî vî navî bin".
Endamê komîteya amedekar parêzer Mihemed Neîmî jî got wê di konferansê de du mijaran esas bigirin; yek jê rakirina tecrîdê li ser rêber Abdulah Ocalan, her wiha dadgeheke navneteweyî ji bo darizandina çeteyên DAIŞ`ê.
Konferans bi hilbijartina 7 parêzeran ji bo rêveberiya yekîtiyê û 2 parêzeran ji bo hevserokatiyê bi dawî bû.



## Cenazeyê şehîd El-Xelef li Hesekê hat veşartin



Cenazeyê endamê Hêzên Ewlekariya Hundir Mahir El-Xelef bi merasimekê li goristana Şehîd Dijwar ya Hesekê hat veşartin.
Bi hezaran şêniyên bajarê Hesekê cenazeyê endamê Hêzên Ewlekariya Hundir Mahir El-Xelef ku li ser erka xwe şehîd bûbû, bi merasimekê spartin axê.
Di merasima li goristanê de bi navê Meclisa Malbatên Şehîdan a Hesekê Şêxa Xelîl, sersaxî ji malbata şehîd re xwest û soza şopandina xeta şehîdan da.
Bi navê hêzên leşkerî û Hêzên Ewlekariya Hundir fermandar Idrîs Hesekê jî got, "Mirov nikare gotin û hestên xwe beramberî lehengiya şehîdan bîne ziman. Çimkî fedekariya şehîdan di ser gotinan re ye. Lê em dikarin soza xwe ya şopandina xeta wan bidin."
Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Aya Keleş nasnameya şehîd xwend û radestî malbatê kir.
Di dawiyê de cenazeyê şehîd di nava tilîliyên dayîkan de hat veşartin.


## HPG: Operasyonên dagîrkeran bêencam bi dawî bûn

Artêşa Tirk ya dagîrker ku li gelek herêman li dijî gerîla dest bi operasyonê kiribû, bi rengekî bêencam neçar ma vekişe.
Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê wiha ye: "15'ê Îlonê li Zozanê Ava Berxa yê navçeya Xîzanê ya Bedlisê, hêzên me li kemîna dijmin rast hatin û li vir şer qewimî. Jimara leşkerên dijmin ên di vî şerî de hatîn cezakirin û birîndar bûyîn nehat zanîn. Piştî ku hêzên me bi serketî ji kemînê derketin, artêşa Tirk a dagîrker roja 16'ê Îlonê leşkerên xwe danîn herêmê û dest bi operasyonê kir. Operasyonê heta 21'ê Îlonê dewam kir û bi rengekî bêencam bi dawî bû.
Roja 21'ê Îlonê artêşa Tirk a dagîrker piştî ku bi helîkopteran bombe li qada Navsera Cûdî barandin, bi helîkopteran leşker danîn herêmê û dest bi operasyonê kir. Operasyon 22'yê Îlonê bêencam bi dawî bû.




## Balafirên şer gundekî Kanîmasî û gundekî Zaxo bombebaran kirin

Balafirên şer yên dewleta Tirk ya dagîrker gundê Bazê yê herêma Berwarî Bala ya ser Kanîmasî ya Amêdiyê bombebaran kirin.
Li gorî Rojnews'ê balafirên şer yên dewleta Tirk ya dagîrker gundê Bazê yê herêma Berwarî Bala ya ser Kanîmasî ya Amêdiyê ya Başûrê Kurdistanê bombebaran kirin.
Derbarê ziyana bombeberanê de ti agahî bi dest neketin.
Balafirên dewleta Tirk herwiha gundekî bajarokê Batûfa yê Zaxo jî bombebaran kirin. Ji ber bombebaranê ziyaneke zêde gihat xanî û baxên welatiyan.



## Divê gel li paşroja xwe xwedî derkeve

Zekî BERDRAN



Li Sûriyê şer û dagîrkeriya Tirkan dewam dike. Diyar e ku ti berjewendiyên gel div î şerî de nînin û şer naxwaze. Digel wê divê dewamkirina şer çawa were diyarkirin? Rêveberiya Şamê di çarçoveya desthilatdariyê de nêzîkî pirsgirêkan dibe. Hêzên ku ji wan re tê gotin dijberiya Sûriyê nasnameya xwe winda kirine û piraniya wan ketine binê fermanên dagîrkerên Tirkan. Çawa ku hat dîtin bi fermanên dagîrkerên Tirkan di dagîrkirina Efrîn û Serê Kaniyê de li pêşiyê meşiyan. Her sûcê dermirovî kirin.
Berî niha bi demekê heyeteke MSDê ji bo hevdîtinan li Moskowa bû. Carayekê bû ku Lavrov bi vê heyetê re hevdîtin kir. Piştî wê nûnerê taybet yê Emerîka yê ji bo Sûriyê Jeffrey bi nûnerên bakur-rojhilatê Sûriyê re hevdîtin kir.
Dewletên dinyayê yên mezin yên weke Emerîka û Rûsya li Sûriyê ne. Dewleta Tirk jî bi xwespartina van dewletan seferên dagîrkeriyê kirin. Bi hezaran mirov kuştin. Bi sedhezaran jî ji warên wan kirin. Eşkere sûcê qirkirinê kir. Hindik jî be ev sûcên şer ji aliye komisyonên NY ve hatin diyarkirin û ji rayagiştî re hatin ragihandin.
Bi navê Astana û Soçê Rûsya bi Îran û Tirkiyê re gelek hevdîtin kirin. Di van hevdîtinan de mijara hevbeş dûrxistina Kurdan ji wan pêvajoyan bû. Halbiku Kurdan bi gelên Sûriyê re li bakur-rojhilatê Sûriyê DAIŞ paqij kiribû û rêveberiyên xweser ava kiribûn. Li Sûriyê ciyê yekane yê modela demokratîk ev der bû û ji sisiyên Sûriyê bû. Beşeke girîng ya welat li derve bimîne wê çawa çareserî çêbûya? Çawa ku heta niha ti çareserî derneketin. Û halê hazir jî ti çareserî xuya nakin.
Tirkiyê hezeke mezin ya leşkerî biriye Idlibê. Herêmên din jî yên bakur-rojhilatê Sûriyê di binê gefên dagîrkeriyê de digire. Bi hezaran ciwanên Ereb bi erzanî ji bo xwe kirine leşkerên bipere. Ji gelek welatan bermayiyên DAIŞ û EL-Nusra kom dike û dixebite nasnameyeke siyasî ji wan re bide qezenckirin. Ji bo tevlîhevkirina Sûriyê û rêxistinkirina kuştina mirovan didomîne.
Sûcûn Tirkiyê kirîn Emerîka û Rûsya tevan dizanin. Lê ji ber berjewendiyên xwe yan bêdeng dimînin, yan ji bo bidestxistina tawîzekê dikin mijara bazarê. Dema wisa dibe ne dagîrkeriya Tirkan diqede, ne pêşiya dagîrkeriyên nû tê girtin. Rûsya girtibû ser xwe ku rêveberiyên xweser û Şamê li hev bîne. Lê heta niha ti pêşketin çênebûne. Şamê di hişmendiya xwe ya Baasê de ti guhertin çênekirine. Hebûna Îranê ya li Sûriyê tê tengavkirin. Lê Emerîka Girê Spê û Serê Kaniyê pêşkêşî Tirkan kirin.
Halê hazir başroja gelên Sûriyê di destê hêzên weke Emerîka û Rûsya de tê dîtin. Diyar e ku Emerîka ne bi serê xwe ye yî. Carna koalisyonê hevalbendên xwe li derve dihêle, lê bi gelek dewletan re şirîkatiya wê heye. Dewletên Ereban jî li derveyî Emerîka nikarin helwesteke xweser nîşan bidin. Ji ber wê divê gelên Sûriyê van geşedanan û vê rewşê bibinin û binirxînin. Nikarin paşroja xwe bi tevayî bi hêviya wijdana hêzên derve ve bihêlin.
Ji bo destwerdana li geşedanan û çareseriyê pêwîstî bi hêzê heye. Eger xwe bi rêxistin nekin û nebin hêz ti kes guhê xwe nade wan. Li bakur-rojhilatê Sûriyê li ber xwe dan û bûn hêz. Ji ber wê karîn rêveberiyeke demokratîk ava bikin û xwe bi rê ve birin. Piştî niha jî ji bo parastina hebûna xwe û ji bo ku bikarin alîkariya çareseriyê bikin, neçar in xwe xurttir bi rêxistin bikin. Lewre di serî de dewleta Tirk hebûna wan di binê gefa gelek hêzan de ne. Herêmên xweser kirine hedef. Herêmên xweser divê hem modela demokratîk baş biparêzin, hem rêxistina hundir kûr bikin. Mirovên li van herêman mayîn, divê di saziyekê de li deverekê ciyê xwe bigirin. Divê kesek tenê jî bêrêxistin nemîne. Li akedemiyên demokratîk yên pêşengiya gel dikin divê bênavber bên perwerdekirin. Komîn û meclis di heman demê de divê bibin dibistanên afirandina civakeke demokratîk.
Riya herî rast ku di gel de li çareseriyê bigerin. Piraniya hêzên din ne li vir dijîn. Yên li vir dijîn û mayîndeyên vir gelên Sûriyê ne. Ji ber wê divê gel bi zanebûneke kûrtir xwe bihêz bikin û ew bixwe paşroja xwe diyar bikin. Çareseriyên ji derve ve bi ser wan de disepînin divê çawa ku qeder be stûyê xwe xwar nekin. Pêwîstiya Sûriyê ya herî bingehî ka wê desthilatdarî di navbera kê û kê de bê parvekirin. Berî her tiştî ya pêwîst û bingehî ku bikarin bibin civakeke demokratîk û birêxistinkirî.